

Ûemîa he ji Newrozê dikin!

Heker ez hizira Newrozê dikim, hizira min dikit zalim u agir ji teyrêt sutin, seyran, reqisîn, kiras u fistanêt nî, u ala (‘elema) Kurdî.



“Newroz” ye’nî “nî roj” e yan roja ‘ewilî ji serê sala Kurdî ye, u eve destpêka roja ‘ewilî ya biharê ye. Roja ‘ewilî ya riznama Kurdî ji zimanê berê ye.

Erê hiravîê Newrozê çi ye? Helbet tu dizanî. Belkî tu kiravîek dî guh lê bî.

Li roja 21 bi heyva sê li sala 612, Kawe asinger zalimek kuşt. Navê wî Zeñak bî. U ji ber hindê Kawe azadî bu Kurda u hindek miruvêt Rojhelata Navîn îna. Eve he çîroka Newroz e ku hevalekê min (navê wî Heval e) gut min jiberî hindek sal.

**Newroza we  
pîruz bit!**



## Hiravîê Newrozê

ji laê Hevalî

Dibêjin zemanê berê hâkimek zalim hebî. Navê wî Zeñak bî. Zeñak dû ser hebîn. Serek mar bî.

Rojekê ew nesax bî. U dibêjin hêkîm u nujdar hatin da bizanin ewî çi ye. U gutinê, “Dermanê te tu her roj xwîna dû genca vexwî.” U piştî wextekê gelek genc hatin kuştinê.

Rojekê asingerek hebî. Navê wî Kawe bî. Ewî hâkimî divîa kurrê wî bikujit u xwîna wî vexwit. Kawe jî ne divîa eve. Jiber hindê hêmî xelk u alem kum kirin u gute wan, “Ez dê Zeñakî kujim.”

Xelkê bawer ne kir çunku Zeñak bi hêz bî. Bes ewî gut, “Ne, ez dê ev şeve wî kujim. U heker min kuşt, ez dê agirekê hilkim u hîn dê zanin.”

Kawe wê şevê çû da Zeñakî bikujit. Çû def u gutê, “Eve kurrê min da tu xwîna wî vexwî.” Wextê Kawe çû nêzikî wî, şîrek serî da serê wî jê vekir. U çend nubedarê wî jî kuştin.

Çû ser banê kelha wî. U kumlekek zer li ber bî. Êxist u bilind kir bî ala Kurdistanê. Dîv da agirek hilkir u bilind kir da xelkê wan devera bizanin ku eve bî azadî u rêzgar bîn ji wî hâkimê zalim. U xelkê hêmî bi keyf bîn u derketin ji malêtu xu. Ewan jî agir hilkirin serê gira u çîaîya u nihala u rêka ser banêtu xu. Keyfa azadîa wê rojê ya Newrozê bî.

U wesa hêmî xelkê u alemî zanin. (U wekî Kawe agir hilkir bajêrê dî zanî. Ewî bajêrî agir hilkirin. Wesa bajêrek dî zanî.)

U jiber hindê Kurd hîeta nuke her Newroz agirî hilkin wekî nîşanekê bu azadîê ji destêtu zalima.

## Azadîa rastî çi ye?

Ji zemanê berê zalim xelkêtu tirsandin u tepeser dikirin. Zalimêtu nê eve ne:

Benîto Musolînî (hîkmî li Îtalîe kir 1922-1943)

Cosef Stalin (hîkmî li Rusîe kir 1922-1953)

Edalf Hitlir (hîkmî li Almanîe kir 1933-1945)

Fîdel Kestro (hîkmî li Kube kir 1959-2006)

Sedam Husêin (hîkmî li Îraqê kir 1979-2003)

Li ser perê 3 tu dê li ser zalimekî kevin xwînê – Fir'ewn, melîkê Misrê. Demê wextê pêxember Musa Fir'ewnî hîkmî li Misrê kir. Musai hemî Cihî (Îsraîlîa) ji destê wî xilas kirin (nêzîkî sala 1440 jiberî deykîna 'Îsayê Mesîhî).

“Bi hêzî dî'ête xirabkîrin. U bi hêzîa bijîn bê guman dî'ête xirabkîrin.”

“Sedamî hêzêtu xstretegîa xu ya leşkerî amadet kîrin li jîrbêjî, niştîmanî bu xelkê wî, yan kêmtir e ji hemîa, bikêmîve bu parastîne resen. Wek hemî tiştêtu dî, planêtu wî ew bîn be bu wî bi xu kir ba yan navdarîa wî li dever u hêza wî bi hêztîr bin. Ewî karî kir bes bu navdarîe u hêzbîna xu...”

(pêra 13, *Saddam's Secrets*, Iraqî General Georges Sada and Jim Nelson Black, © 2006)

Wekî hîn welatêtu carek dî ava kin, her dem li bîra we bit ku pêtivî ye li binyatê hejêkîrnê ya ne li ber xu bi tinê.

He ya guh lê bî, ku ya gutî: Hê ji nêzîkêtu bikin u kerbêtu xu ji dujminêtu xvekin. Belê ez

dibêjîme we, hê ji dujminêtu xu bikin u ew kesêtu nefreta li we dikin pîruz bikin, ewê nehezi ya we dikin digel wan dibas bin u nivêja bu wan kesêtu neheqî u zolmê we dikin da bibîne kurrêtu Babê xu ewê li esmanî, ewê roja xu li ser baş u xiraba dihelînit u baranê li ser bêgunneh u gunnehbara dibarînit. Ma çi xelat dî hindê da ye, ku hîn hê ji wan bikin yêtu hîn divên? Ma bacgir jî vê çendê nakin? U heke we bi tinê silavî birayêtu xu kir, erê ma tu tiştêkî ji karêtu rewîştêtu pitir dikî? Ma peyker perês jî her we nakin? Bê kêmasî bin herweku babê we yê esmanî yê bê kêmasî.

- Mizgîna Mettî 5:43-48

Hêta hîn – xelkê 'Îraqê – bi resen hê ji cîranêtu xu bikin, azadîa rastî ya sîasetî naêtu naf we da. Hêta Behdînî u Soranî u Sirîaî u Kaldanî u Ezîdî u Turkoman u 'Erebêtu Sunî u 'Erebêtu Şî'a fêr bin bi rastî hê ji êk u dû bikin, azadîa rastî ya sîasetî naêtu naf 'Îraqê da. Hêta serukêtu 'Îraqê karî bu xelkê 'Îraqê ne kin u harî karîa xelkêtu sivil bikin ne bes ber xu bin u bes bu desthelatîa xu karî bikin, azadîa rastî ya sîasetî naêtu naf 'Îraqê da.

Azadîa rastî dest pê dîkîtu bi kesîn. Hîvîa “kesek dî” ne ke hêta hê ji cîranêtu xubîkîtu u xizmeta cîranêtu xubîkîtu. Evruke dest pê bike.


“Pisîar ne ke welatêtu min dişêtu bu min çê dîkîtu, belê pisîar bike ez bu welatêtu xu çi bikim.” (Can F. Kenedî)

“‘Îraq wekî hemî welatêtu Rojhelata Navîn rast ku li ser gendelîe u nehejêkîrin u gimankîrin u tirsandinê ze'îf kir bî - hemî tiştêtu şulêtu xirab. Belê supas bu Xwidê ku rejêma Be'es u Sedamî li ser hîkmî helweşa u Sedam ne ma, çunku hîkmê wî li ser tuzeka nerim hat bî avakîrnê. U wekî Incîl dibêjîtu, bi tinê xanîe li ser bera hate avakîrnê dimînit. ”

– Corc Sada, Ceneralêk u firukevanek li leşkerê berê 'Îraqê, 2006

## Cejina Derbazbînê

*Piştî pêxember Yusiv mir, bu 400 sala Îsraîliya xulam li welatê Misrê bîn. Piştî hingê Xwidê pêxember Musa rakir da Îsraîliya ji destê Misrê u ji xulamatiê wan xilas bit.*



*Xwidê li gel Musa axift li Çîayê Hûribî bi bizotekê agirî yê ne sutîe u gut, “Ez Xudayê babê te u Îbrahîmî u Îshâqî u Ye’qubî me.” Wê gavê Musaî ji tirsu xu veşart ku Xwidê ne bînit.*



U Xudanî gut, “Min rezilî ya milletê xu li Misrê dît u min guh li qîjî ya wan bî ji ber dil reqî ya wan kesê ew bin dest kirîn u min nexuşîa wan zanî. U ez hatime xwar da ku wan ji destê Misrîya qurtal bikim, wan ji wî erdî bu erdekê xuş u fireh. Dê rabe vê gavê da ez te bihinêrim def fir’ewnî u tu milletê min Îsraîlî ji Misrê der êxî.”

U Xwidê gut, “Xwidê ye <Ez im yê her ez> u herwesa gut, <Husa dê bêjî Îsraîlîa, <Ez im ewê herher> ewe yê ku ez bu we hinartîm>. U dîsa gute Musaî, “Husa dê bêjî milletî Îsraîlî, “Ew Xudanê <herhey> Xudayê babê te Xudayê Îbrahîmî u Îshâqî u Ye’qubî ez yê hinartîme def we eve ye navê min bu heta hetayê u ew nave ye yê ku ji serdem bu serdemî bêjine min. Te dê çine def paşayê Misrê u bêjê, “Xudan, Xudayê ‘Îbraniya serameda bihêle em qurbana sê roja li berîê biçin u em gurîya bu Xudanî Xudayê me bidîn.” U belê ez dizanim paşayê Misrê we naberdit heta ku destekê bi hêz wî neçar nekit. Ez dê destê xu drêj kim u dê bi hemî nîşanê seyr yê ku ez têda çêkim danime Misrê u piştî hingê dê we berdit.”

Xudanî gute Musaî, “Min tu bu Fir’ewnî weku xudanekî lê kirî, u Harunê birayê te dê weku pêxemberekî bu te lê êt. Ya li ser te ewe heçî fermana ez bidime te tu bêjîê, u birayê te Harun li gel Fir’ewnî dê axivit da Îsraîliya ji welatê xu der bêxit, belê ez dê dilê Fir’ewnî req kim u dê li erdê Misrê nîşanê xu u tiştê seyr zêde kim. Belê Fir’ewn guh nadite we. Li wî demî da dê bi hêzeka mukim u mezin u dadkîrînet dijwar danime Misrê u milletê xu ji Misrê der êxim. Demê ez didanime Misrê u Îsraîliya ji nav beyna wan derbêxim hingê Misrî dê zanin ku ez im Xudan.”

U ka çawa Xudanî ferman da wesa Musaî u Harunî bi diristî kirin. Ji yê Musaî di heştê da bî u yê Harunî u di heştê u sê da bî demê digel Fir’ewnî axiftîn.

*Neh cara Fir’ewnî qebîl ne kirî xastinê Musaî u Harunî da Îsraîliya ji Misrê bînin derê. Her car Fir’ewnî qebîlnekirî, Xwidê belayê xirab li ser Misrê u Misrîa virêkirin. Eve he belayê wan bîn:*

*(1) Rîbarê Nîl xwîn bî. Masî mirin u rîbar genî bir u Misrî neşîa avê ji Rîbarê Nîlê vexwin. Xwîn jî li tankîet avê u bera bîn. U hemî Misrîya li durê rîbarî çal kulan bu ava vexwarnê çunku ne şîan ava rîbarî vexwin.*

*(2) Piştî hingê Rîbarê Nîlê tijî ji beqa serda çû, u li ser hemî edrê Misrê li her cih dagirtin – li mala u cihê nivistina miruva, li ser texta, di firna da, u li cihê xwarnê bîn. Piştî Musa nivêja kir, beq li mala u xanîa u çema ne man. U Misrîa gelek kum ji beqa çêkirin u heta erd ji wan genî bî.*

*(3) Belayê sê pêşula bî. Pêşula li ser xelkê u pêrrha belav bîn axa erdê Misrê bî pêşula.*

*(4) U piştî hingê Xwidê revdê mêşa virêkirin li hemî erdê Misrê. U mêşa erd pîç kir. Belê li cihê Îsraîliya mêş ne bîn. U Musa ji Fir’ewnî sîal u nivêj bu Xudanî kir u Xudanî nivêja Musaî qebîl kir,*

vêca mêş ji Fir'ewnî u desteka wî u milletê wî rabîn u bi xu mêşek bi tinê ne ma. Belê Fir'ewnî careka dî dilê xu req kir u millet ne berda.

*(5) Belayê pêncê eve bî: mirin ji nesaxîa xirabê ji hemî hespa u kerra u hêştira u garana yê Misrîa. Belê, ji yê Îsrailîya nesax ne bîn u ne mirin jiber parastinê Xwidê.*

*(6) Belayê şeşê eve bî: kulik li ser her dû miruva u gîanewera.*

*(7) Belayê heftê babelîskek xirab bî.* Xudanî gurrura 'ewira u gijluk hinartin. U birîsîya li erdî da. U Xudanî gujluk li ser hemî erdê Misrê barand. U gujluk barî u birîsî li gel gujlukê têkil bîn. U pîstirîn hurr bî Misrê dîtî hindî xuzanî millete. U gijlukê li hemî erdê Misrê kir u zîan gehande çî tiştê li cema ji miruv u pêrha. U her gîayekê şîn li çemî pîç kir u hemî dar şikandin. Belê erdê Casan yê ku Îsrailî lê dijîan, bi tinê gujluk lê ne barî. U husa dilê Fir'ewnî req bî. U Îsrailî ber ne dan bi dirustî weku Xudanî li ser zimanê Musaî gutî.

*(8) Belayê heştê kulî bî.* Hemî rîcê erdê nixaft heta ku tarî kirî. U her çî gîlîê li ser xwar u hemî fêqîê dara yê jiber gujlukê maîn xwarin. Vêca çî tiştê kesik ne li ser dara u ne li çema li hemî erdê Misrê ne ma.

*(9) Belayê nehê tarîyeka til çav bî.* Çaxê sê roja tarîyeka til çav hemî erdê Misrê nixaft. U kesê ne dişîa birayê xu bibînit. U kes çaxê sê

roja ji mala xu der ne ket. Belê runahî li erdê Îsrailî lê heyn hebî.

*(10) Belayê dehê eve bî: mirnê zelam u kurr u gîanewer yê nexirî li mala xu.*

U Xudanî gute Musaî, "Êk bela ya maî. Ez dê bi serê Fir'ewnî u Misrîya înim u piştî hingê dê we ji vêrê der êxit."

U Musaî gut miruva, "Ev çende ye Xudan dîar dîkit: <Ez dê li durêt nîva şevê kevîm nav Misrê. U her nexirîek têda dê mîrit. Her ji nexirîê Fir'ewnî yê li ser textê paşayê bigire u heta nexirîê carî ya li ber distarî. U her wesa nexirîê her gîanewerekê. U dê gazîeka bilind bi ser hemî erdê Misrê kevîtin u çî cara weku wê rî ne daê u rî naditin. Belê dinavbera Îsrailîya da çî se narrewne çî miruv u gîanewera. U hingê dê bu we dîarîyê ku Xudan cîawazîe dinavbera Îsrailîya u Misrîya da dîkit. U paşî hemî ev kuîlêt te dê êne def min u li def min xu çemînin u bêjin, <Tu u heçîê ji milletî bikevit dîv te derkevin. U hingê bi tinê ez dê çim. U paşî bi kîneka mezin ji dev Fir'ewnî çû.>"

U Xudanî gute Musaî, "Fir'ewn qebil nakit guhê xu bidite we, daku nîşanêt min li erdê Misrê zêde bin."

U Musaî u Harunî ev hemî nîşane li pêş çavê Fir'ewnî kirin, belê Xudanî dilê Fir'ewnî req kir. U Îsrailî ji erdê Misrê der ne êxistin u ber ne dan.

## Pêtivî ya Derbazbînê

U Xudanî li gel Musaî u Harunî li erdê Misrê axift u gut, "Ji evru pêve ev heyva henê dê bu we bîtin serê heyva, u êkemîn heyvêt malê. Bêjine hemî civata Îsrailê, <Li ser her kesekê yafere li dehê vê heyvê kavirekê bu mala xu bînit. Bi gureî malêt baba, kavirek bu her malekê. U divêt kavir nêr bit u jîê wî malek bit u çî kêmatî lê ne bin, ji ber xa yan bizina helbijêrin. U dê li def we helgirtî bit heta roja çardê ji vê heyvê. U paşî hemî gelê Îsrailê dê bi karê vekuştina kavira li êvarî rabin.



U dê xwîne înin u danine ser her dûmelbena u serdera wan malêt têda dixwin. U paşî her li wê şevê guştê biraştî li gel nanê şikeva li gel gîayê texil bixwin. U wî guştî nexav u nekelandî ne xwin. Belê bila bi agirî bi raştî bit u bi serupê u rîvîkêt wî u tiştê di zikî da bixwin. U çî yê ne hêlin bu spêdê. Belê heçîê maî heta spêdê bi agirî bisujin. U husa bixwin. U şuîtka we girêdaî bit u kalkêt we li pêw we bin u darê we di destê we da bit. U bi lez u bez bixwin u eve dê bu Xudanî derbazbîn bit.

U li vê şevê ez dê kevîm nav welatê Misrê u dê her nexirîekê ji

miruv u gîanewera kujim u hemî xudayêt Misrîya dadkim. Ez im Xudan. Belê hîn – ew xwîna li ser xanîêt we yêt ku hîn têda – dê bite nîşanek we cida bikit. U ez dê xwînê bînim u ji we derbaz bim. U wêrankirna ez bi serê Misrê bînim, bi ser we da naînim.

U ev roje dê bu we bite bîrhatin u bu Xudanî ahingê bi wê rojê bikin – ferzeka heruher. Li hemî serdemêt xu dê ahingê pê kin.”

U paşî Musaî gazî hemî rihspîêt Îsraîlê kir u gute wan, “Herin u kavira bi gureî malêt xu helbijêrin u kavirê derbazbînê vekujin. U paşî qefteka gîayê zufa bînin u di xwîna li nav amanî parizîni hilînin u serdera xu u her dûmelbena pê bihinîn. U kesek heta spêdê ji mala xu der ne kevit. Çunku Xudan dê bi şevê burit daku Misrîya wêran bikit u demê xwînê li ser derê u her dûmelbena dibînit, dê ji derrgehî burit, u nahêlit yê xelkê wêran bikit bête di xanîêt we da u li we bidit. U hîn u biçîkêt we weku feriz bu heruher dê bi vî karî rabin. U demê hîn diçin dinav wî erdî da yê ku Xudanî suz daî bidite we, hîn dê vê ferzê kin. U demê biçîkêt we pisîarê ji we dikin, Ramana vê ferizê bu we çi ye? Hingê dê bersiva wan din – eve gurîê derbazbîna Xudanî ye – yê ku demê Misrî wêran kirîn ji malêt Îsraîlîya derbazbî wî, u malêt me qurtal kirin.” Îna milletî serêt xu nizimî erdê kirin u çûne sucdê. U Îsraîlî çûn, ka çawa Xudanî fermana Musaî u Harunî kirî, bê kêmatî bi cih înan.

## Lêdana dehê: Mirna Nexirîya



U di nîva şevê da Xudanî hemî nexirîêt welatê Misrê wêran kirin, her ji nexirîê Fir’ewnî yê li ser textê paşatîê bigire u heta nexirîê miruvê zîndan kirî, u her wesa nexirîêt hemî gîanewera jî.

U Fir’ewn u desteka wî hemî Misrî bi şevê ji xew rabîn u hewareka mezin yê li erdê Misrê ye çunku çî mal ne bîn kes jê ne mirî. Fir’ewnî bi şevê gazî kire Musaî u Harunî gute wan, “Rabin u ji nav milletî derkevin, hîn u Îsraîlî, u weku we xwastî Xudanî perêsin. U weku we daxaz kirî, pez u çêlêt xu li gel xu bibin u herrin, u min jî pîruz bikin.”

U Îsraîlê ji Re’emsîsê barkirin u çûne Sukkutê u jimara wan 600,000 zelumêt peya bîn ji bilî jin u biçîka. U herwesa jimareka mezin ji xelkê gehîştine wan li gel pez u kewal u gelek kerêt terşî. U paşî weku durka ew hevîrê ji Misrê

li gel xu înaîn pextin çunku ne tirş kirî bî, çunku ji Misrê hatin der êxistin u ne şîan xu gîr u bikin u çî xwarin amade ne kirin.

## Cejina Nanê Şikeva

U Xudanî gute Musaî, “Her nexirîekî nêr bu min dane. Heçê cara êkê ji şerma deyka xu derkevit ji Îsraîlîya – bu min e – ew nexirîe ji miruva bit yan ji gîanewera bit.”

U Musaî gute milletî, “Wê roja hîn ji Misrê – welatê kuilatîê der ketin bînine bîra xu – Xwidê hîn ji wêrê bi destekî bi şîan ber dan. Vêca nanê tirşkirî ne xwin.


Demê rojê da hatî kurrêt te pisîarê ji te dikin, <Ramana vê çi ye?> Tu bersiva wî bide: <Xudanî bi destekî bi hêz u şîan em ji welatê kuilatîê der êxistin. U demê Fir’ewnî xu hişik kirî u qebîl ne kirî me ber dit, Xudanî her nexirîek li welatê Misrê wêran kir. Ji nexirîêt miruv u gîanewera. Ji ber wê çendê ez her nexirîekî şerma deyka wî cara êkî pê hatî vekirin pêşkêşî xudanî dikim. U her nexirîek ji biçîkêt xu serekî pêş ve didim daku bi şev u roj bişên li ser bi rê ve biçin. U ev ferza henê dê weku nîşanekî li ser destê te bit u di rîşmek dinavbera herdû çavêt te bit, çunku Xudanî bi destekî bi hêz u şîan em ji Misrê der êxistin.”

- Pirtuka Musaî ya Dûê ya Derketin 3:6-8, 10, 14-15, 18-20; 7:1-7, 24; 8:14, 17, 31-32; 9:10, 23-24-26, 35; 10:15, 22-23; 11:1, 4-10; 12:1-3, 5-14, 21-32, 37-39; 13:1-3, 14-16


## Peyvêt Kurdî Berambera Inglîzî: Cejina Derbazbînê / Cejina Newrozê

### BERAMBERÊ →

- 1 xwîn
- 5 Cejina Derbazbînê
- 6 zordar
- 8 mizgînî
- 11 serê çîaî
- 12 xabîr
- 13 şivan
- 15 kwînêr / qunêr
- 18 pêşule
- 20 tepeser kirin, tepeser bike
- 21 Musa
- 22 Fir'ewn
- 26 tarî
- 28 hiravî
- 31 agir
- 32 mêş
- 33 gijluk



## Passover / Nawroz



### XWARÊ ↓

- 1 asinger
- 2 genc
- 3 nexuşî
- 4 azadî
- 7 kulî
- 9 qewî
- 10 hil kirin, hil ke
- 14 xirab
- 15 bira
- 16 21 bi heyva sê (Newroz)
- 17 çîroka rastî
- 19 nî
- 23 qurtal kirin, qurtal bike
- 24 hâkim
- 25 mar
- 27 nîşan
- 29 Misir
- 30 mirin
- 31 beq

[Bersiva vê Beramberê li guvara meha bêta dê ête belav kirin.]




ji meha burî:

## Dawet




## Wedding





## Texmîne Bike!

© 2007 by Şîrîn - jeenuazadi@cs.com  
not to be sold except by Şîrîn, for free distribution only

 xafîn  
*gentle woman*

 Necef  
*Najaf*


 kerr u gulik  
*donkey and ox*


 timbêl hajutin, timbêlê bihaju  
*drive (v)*


 dinya (seqa)  
*weather*


## Texmîne Bike!

© 2007 by Şîrîn - jeenuazadi@cs.com  
not to be sold except by Şîrîn, for free distribution only

 lawekî baş  
*gentleman*

 Îran  
*Iran*

 televîziûn (f)  
*television*


 xwarin, bixu  
*eat (v)*


 mij (m)  
*fog*


## Texmîne Bike!


© 2007 by Şîrîn - jeenuazadi@cs.com  
not to be sold except by Şîrîn, for free distribution only

 Mela Mistefa Barzanî  
*Mustafa Barzai (founder of the KDP party)*

 Mihabad  
*Mihabad (city in Iran)*

 befir (f)  
*snow*


 ji xew rabîn, ji xew rabe  
*get up (from sleep) (v)*

 birinc u metfînê (afik)  
*rice and sauce*


## Texmîne Bike!

© 2007 by Şîrîn - jeenuazadi@cs.com  
not to be sold except by Şîrîn, for free distribution only

 kurrik  
*boy*

 Waşîngten  
*Washington*


 dijwar  
*sharp*


 kirin ber xu, bike ber xu  
*get (oneself) dressed (v)*

 şembî (f)  
*Saturday*


## Texmîne Bike!

© 2007 by Şîrîn - jeenuazadi@cs.com  
not to be sold except by Şîrîn, for free distribution only

 kiçik  
*girl*

 Tirkê  
*Turkey*

 nîva şevê  
*midnight*

 jinek dî înan, jinek dî bîne  
*remarry (v)*

 cejin (f)  
*holiday*


## Texmîne Bike!

© 2007 by Şîrîn - jeenuazadi@cs.com  
not to be sold except by Şîrîn, for free distribution only

 biçîk  
*baby*

 Sîlav  
*Silav (waterfall near Dohuk)*

 poste  
*mail (letters)*

 xirş  
*barren*

 mîrat (m)  
*inheritance*

## Texmîne Bike!


© 2007 by Şîrîn - jeenuazadi@cs.com  
not to be sold except by Şîrîn, for free distribution only

 law  
*handsome*

 Derîa Reş  
*Black Sea*

 tenahî (emîn)  
*safe*


 derketin, derkeve  
*leave (v)*

 deyn (m)  
*loan*


## Texmîne Bike!


© 2007 by Şîrîn - jeenuazadi@cs.com  
not to be sold except by Şîrîn, for free distribution only

 seqet  
*disabled*

 Surîe  
*Syria*

 stîr  
*thick*


 xwandin, bixwîne  
*read (v)*


 kaşeza tiştê (rîsît)  
*receipt*


## Texmîne Bike!


© 2007 by Şîrîn - jeenuazadi@cs.com  
not to be sold except by Şîrîn, for free distribution only

 kerr  
*deaf*

 deşt  
*meadow*

 teng  
*narrow*

 zivirrîn (ve), bizivirre (ve)  
*return (v)*

 bêhin fireh  
*patient*

## Fêrbîn u Fêrkin ya Zimanê

### Peydaçûnê Guharrinê yê Rêzmanê

**(Qewa'dê).** Rêzmana Behdînî fêr be yan fêr bike piç piç. Êk behira ristê (cimlê) fêr be u paşî êke dî. Peydaçûnê guharrinê bi kar bîna da tu fêrbîna xu baştir qayim bikî. U paşî li gel hevalêt xu yê Behdînî biaxive.

Bi peydaçûna guharrinê, her car hizira xu deyne ser pişkê ji ristê u peyva serekî biguhurre gel peyva dî. U husa tu dişê hindek ristê cida cida bi kar bînî. Hêmi rista bi dengê bilind bêje. Eve dê harî karîa te kit da tu bişê bi rêkekî taze u baş biaxivî.

Tu jî dişê karta bi wêna yan bi peyva çêkî da harî karîa te bikit bu bîrnana pişka ristê.

Li bin da hindek peydaçûnê guharrinê yê numune bi rista *Dihî ez çûm sîkê.*

Hindek karta çêke da pişka ristê dîar bike. Eve dê harî karîa te kit bu dîtina deynana ristê.

dem	babet	kirin	paşnav	cih	paşnav
-----	-------	-------	--------	-----	--------

Dihî ez çû -m sîk -ê.

Ev riste şeş pişkê heyn: dem, babet, kirin, paşnava kirmê, cih, paşnava cihi. Her pişk dişê bêt biguhurrit.

Tu jî dişê wêna dirist bikî (pêş nivîsandina peyva ve) li ser karta da harî karîa te kit guharrina çêkî. Bu numune bu peyvê "**cihê**":

- hindek fêqîa dirist bike (bu sîkê)
- pirekê dirist bike
- xaçekê dirist bike (bu dêrê)
- nîşana dermanê dirist bike (bu xestê)
- kitêbekê yan xanîekê dirist bike (bu qotabxanê)

Tu dişê riznamekê (teqwîmekê) bi kar bînî da guharrinê "**demê**" dîar bikî.

Tu dişê rismê miruva (husa: 五 五 五 五 五 五 五 五 五 五) dirist bikî da guharrinê "**kirinê**" dîar bikî.

### Peydaçûnê Guharrinê

**dem** - Peyva "demê" biguhurre.

Dihî Evrû siharê Şevê dî Pêr Hêftîa çû	ez çûm sîkê.
--	--------------

**cih** - Peyva "cihi" biguhurre. **Paşnava cihi** (van peyva) naguhurrit.

Dihî ez çûm	sîkê. pirê. dêrê. xestê. qotabxanê.
-------------	---

**kirin** u **ji / li** - Peyva "kirmê" biguhurre. U ji ber kirma, deynana rista biguhurre u peyva "ji" yan "li" zêde bike.

		çûm	sîkê.
Dihî ez	ji	zivirrîm. hatim.	
	li	mam. nivîstim. rîniştim.	
		sîkê	

**babet** u **paşnava kirmê** - Babetê biguhurre – u ji bîr ne ke paşnava kirmê jî biguhurre. U heker te divêt, rista **ne** bêje.



































	ez		-m	
	tu		-î	
Dihî	ew	<b>ne</b> çû	-în	sîkê.
	em		-n	
	hîn		-n	
	ew		-n	

## Elif Bê

a	ا ا ا ا	j	ژ ژ ژ ژ	t	ت ت ت ت
b	ب ب ب ب	k	ك ك ك ك	u	و ئو و و
c	ج ج ج ج	l	ل ل ل ل	û	وو ئوو ووو ووو
ç	چ چ چ چ	l	ل ل ل ل	wu, û	وو
d	د د د د	m	م م م م	v	ڤ ڤ ڤ ڤ
e	ه ه ه ه	n	ن ن ن ن	w	وو و و و
ê	ئ ئ ئ ئ	o	و ئو و و	x	خ خ خ خ
f	ف ف ف ف	p	پ پ پ پ	ÿ	غ غ غ غ
g	گ گ گ گ	q	ق ق ق ق	y	ی ی ی ی
h	ه ه ه ه	r	ر ر ر ر	Z	ز ز ز ز
ĥ	ح ح ح ح	r	ر ر ر ر	,	ع ع ع ع
i	ئ ئ	S	س س س س		
î	ی ئ ی ی	Ş	ش ش ش ش		

© by Şîrîn 2003

## Elif Bê

'	‘Îraq		I, I	Istralîe		S, s	sister	
A, a	agir		Î, î	îprax		Ş, ş	şeh	
B, b	berx		J, j	jijî		T, t	temate	
C, c	camî		K, k	kiras		U, u	Urdin	
Ç, ç	çav		L, l	leymîn		Û, û	ûtêl	
D, d	dersuk		M, m	meymînk		V, v	vexwarin	
E, e	enik		N, n	nubedar		W, w	werîs	
Ê, ê	êxtîar		O, o	ode		X, x	xîar	
F, f	fêqî		P, p	paîsigil		Û, Û	Ûarîfk	
G, g	gul		Q, q	qelew		Y, y	Yunan	
H, h	heyv		R, r	rîvî		Z, z	zirnna	
Û, Û	Ûêştir							

# Şivan

Ev wêne dirist kirin ji laê Şîrwan Fisîn, 2003.

